


Schulamt für die Stadt Dortmund

Ministerium für Kinder, Familie, Flüchtlinge und Integration des Landes Nordrhein-Westfalen

Kommunales Integrationszentrum Dortmund

Stadt Dortmund

## Dêûbavên Hêja!

Dersên zimanê dayîkê bi taybetî ji bo şagirtên di qada zimanê dayikê de xwedi-yê zanîna bingehîn e. Em dixwazin di derbarê vê pêşniyarê de we agahdar bikin!

**Kengê û li ku derê dersên zimanê dayikê tên pêşkêş kirin?**

- zêdebarî dersên dibistanê, bi piranî dema danê êvarî tên pêşkêş kirin
- li gor mezinahiya komikan di hefteyê de ji 3 heta 5 saetên dersê
- di hemû pêngavên dinê de ji pola 1ê heta pola 10an

Hûn dikarin bi navnîşana www.hsu.dortmund.de hemû zimanên li Dortmundê wek dersên zimanê dayikê tên dayîn bibînin.

**Bawername û ezmûnên ziman**

Mamosteya/ê zimanê dayikê pesenda beşdarbûnê dide xwendekara/ê beşdar. Dibistan nota wê/wî ya zimanê dayikê li bawernamê dinivîse. Ji bo dawiya pêngava navîn/amadeyî xwendekar beşdarî ezmûna zimanê dayikê dibe. Nota baş a ew di vê azmûnê de digire, ev not dikare bikeve ber zimanekî biyanî, eger notek baş be, şagirt (xwendekar) dikare derbasî pêngaveke bilindtir be.

**Tomarkirin/ xwe qeydkirin**

Ji bo xwe qeyd kirina berwext hêvî dikin ku hûn niha vê forma xwe qeydkirinê ya pêşwext dagirin. Hûn dikarin vê formê ji cem sekreteriya dibistana zaroka/ê xwe bi dest bixin an jî li ser rûpela (www.hsu.dortmund.de) û piştî dagirtinê carek din bidin sekreteriya dibistanê. Li destpêka sala xwendinê ya bê dê hemû dibistan/xwendingeh li dor zimanên zikmakî bên agehdarkirin. Pişt re dê xwe qeyd kirina dawiyê bi rêya mamosteya/ê dayikê were kirin.

Hûn dikarin formên qeyd kirinê û agahiyên din ji dibistanên zarokên xwe bigirin an jî hûn dikarin ji vê navnîşana înternetê, ji **www.hsu.dortmund.de** bigirin.

Ji bo pirs û pêzanînên zêdetir, bi xweş halî ve em di xizmeta we de ne:

**Schulamt für die Stadt Dortmund**